Gültekin, S. (2020). Hevreferansîya bikeran
di hevokên aloz da. *Folklor û Ziman,* 1(2), 38-60.
**Wergirtin/Received:** 2020-09-02
**Qebûlkirin/accepted:** 2020-10-21
**ORCID:** 0000-0001-8562-6018

# HEVREFERANSÎYA BIKERAN DI HEVOKÊN ALOZ DA

Sinan Gültekin[1]

**Kurte**

Bikerên hevreferans di hevokên aloz da ne bi heman awayî dihên bikaranîn. Di hin cureyên hevokên aloz da yek ji bikerên hevreferans ji hevokê dikeve. Lê hin cure hevok hene ku bikerên hevreferans ji wan nakevin. Gelek pêker hene ku bandorê li vê cudahîyê dikin: Kes, dem, têperî-têneperî, cureyên hevokên aloz. Ev mijar bi awayekî rasterast di gotar û pirtûkên rêzimanî da nehatîye lêkolîn.

Di vê gotarê da, bikaranîna bikerên hevreferans di hevokên aloz da hatîye nirxandin. Gotar, di çarçoveya rêzimana formel da li ser vê mijarê disekine û daneyan bihûrgilî rave dike.



**Bêjeyên sereke:** Hevreferansî, hevokên aloz, kes, têperî-têneperî, cureyên hevokên aloz.

## COREFERENTIALITY IN THE COMPLEX CLAUSES

**Abstract**

Coreferent subjects of complex clauses do not act in the same way. One of the coreferent subjects is dropped from the complex clause. However, there are some kinds of complex clauses that coreferent subjects are not deleted. There are some factors that influence this distinction: person, tense, transitivity-nontransitivity, kinds of complex clauses. This issue is not researched directly in the grammar books and articles.

This article investigates the usage of coreferent subjects in the complex clauses. This article aims to analyze this issue in the frame of formal grammar and intents to explain datas in details.

**Keywords:** Coreferentiality, complex clauses, person, transitivity-nontransitivity, kinds of complex clauses.

1 Lêkolerê serbixwe. Mêrdîn. E-maîl: sinan47mardin@hotmail.com

**Destpêk**

Armanca vê gotarê ravekirina bikaranîna bikerên hevreferans yên hevokên aloz e. Gotar hewil dide pêkeran analîz bike ku bandorê li bikaranîna bikerên hevreferans yên hevokên aloz dikin. Vê mijarê wekî beşeka taybet û serbixwe di pirtûkên rêzimanî da cih negirtîye. Loma wekî mijareka giring û nû em dê li serê rawestin. Gotara me li ser korpuseka fireh hatîye avakirin: Me daneyên xwe ji xebata *Antolojiya Çîrokên Kurdî* ya Firat Cewerî wergirtine. Çîrokên kurdî/kurmancî yên dewr, şêwaz û nivîskarên cihê di vê xebatê da cih girtine. Herweha, ev antolojî ji sê cildan pêk dihê. Lewra korpus û qadeka berfireh pêşkêş dike. Gotar li ser vê berfirehîyê ava dibe û bi çarçoveyeka rêzimana formel daneyan şirove dike. Li gorî rave û analîzên daneyan çend pêker hene ku bandorê li bikaranîn yan jêbirina (deletion) bikerên hevreferans yên hevokên aloz dikin. Di vê gotarê da em dê beş bi beş li ser van pêkeran rawestin û wan şirove bikin.

Heta ku em dizanin ev mijar tenê di sê xebatan (gotar, tez) da hatîye lêkolîn. Mijar di her sê xebatan da jî ne bi awayekî rasterast hatîye lêkolîn. Evmijar wekî binbeşekê di van xebatan da cih girtîye. Yek ji van xebatan gotara Yaron Matrasîya bi navê *Clause Combining, Ergativity, and Coreferent Deletion in Kurmanji* (Hevgirtina Hevokan, Ergatîfî û Jêçûna Hevreferantan) ye. Matrasî (1997) di vê gotarê da behsa têkîlîya hevgirtina hevokan, ergatîf û jêçûna hevreferantan dike û angaşt dike ku çar pêkerên sereke hene ku bandorê li bikaranîn yan jêçûnabikerên hevreferans yên hevokên aloz dikin. Ev pêker ev in: Têperî/têneperî, maneya lêkera bingehîn, kes, hebûna pêşrew (antecedent). Herweha Matras (2002, r. 52) dibêje ku bikaranîna bikerên hevreferans opsîyonel (optional) e.

Xebata din ya Geoffrey Haig e ku bi navê *Alignment in Kurdish: a diachronic perspective* dihê zanîn. Haig (2004) di vê gotara dûrûdirêj da ne tenê li ser kurmancî herweha li ser dîyalektên kurdî yên din jî disekine. Di beşekê da behsa bikerên hevreferans yên hevokên aloz dike û pirtir bala xwe dide xebata Matrasî (1997). Haig (2004) di vê beşê da analîzên Matrasî (1997) şirove dike û ji dêvla pêkerên Matrasî ve behsa hin stratejîyên bikaranîn/jêçûnbikerên hevreferans yên hevokên aloz dike. Stratejîyên ku Haig behsa wan dike ev in: Stratejîya jêçûnabikerên hevpar (delete common subjects strategy), stratejîya zêdekirina cihnavan (pronoun insertion strategy), stratejîya rêzkirina lêkeran (verb serialization strategy), direxbûna ji rêzên lihevkirina nehevseng (avoid discordant agreement sequences), lihevkirina bi

hevoka alikar ra (adjust the agreement of the second clause). Xebata dawî ku em dê behsa wê bikin teza Sinan Gültekin e ku bi navê *Hevokên Temamker ên Berkarî yên Kurmancî yên Devoka Torê* hat pejirandin û weşandin. Gultekin (2019) di binbeşa teza xwe da behsa ketina bikeran û hevokên temamker yên berkarî (bireserî) dike. Herweha behsa têkîlîya jêçûna bikeran û cureyên hevokên temamker (complement clause) dike. Li gorî vê xebatê bikerên hevreferans yên hevokên temamker yên lêkerên modal û pêzanînê ji hevokê dikevin. Lê yên manîpulatîf, pêhisînê û vegotinê kêmtir dikevin. Sedema vê cudahîyê jî taybetmendîyên cihê yên van cure lêkeran e. Her sê xebatan jî cih dane vê mijarê lê ne bi awayekî rasterast û bihûrgilî. Herweha korpusa her du xebatên ku me pêşî behsa wan kir ne korpuseka berfireh e. Zêdetir bala xwe dane axiftina rojane û tenê nivîsên hin nivîskaran. Loma di vê gotarê da tiştê ku nehatîye kirin yan kêm hatîye lêkolîn em dixwazin bikolin û wêneyekî giştî û ronîtir pêşkêş bikin. Berîya ku em derbasî analîz û şiroveyên daneyan bibin em dixwazin behsa du termên giring bikin. Yek jê hevokên aloz û cureyên wan e, ya din jî biker û bikerên hevreferans e. Em bi hevokên aloz dest pê bikin.

Hevoka aloz (complex clause) ew hevok e ku gelek bûyer loma hevok tê da hene (Öpengin, 2014, r. 191). Ev bûyer yan lêker bi rêya lêkerên alîkar, bi rêya gihanekan yan jî bi xêra daçekan bi hev ve dihên girêdan. Hevokeka aloz herî kêm ji du beşan pêk tê: Hevoka sereke û hevoka temamker. (Aydogan, 2013, r. 128). Aydogan (2013) û Bulbul(2019) hevokên aloz nirxandine û cureyên hevokên aloz dîyar kirine. Em dê pirtir dabeşkirina Aydogan (2013) bikarbînin. Gotara me li ser hemû cureyên hevokên aloz ranaweste. Pirtir em dê bala xwe bidin hevokên aloz yên temamker (complement clause), hevokên aloz yên rewşî (sabordinate clause) û hevokên aloz yên hevseng (coordination). Em dê di beşa çarem da li ser van hevokan rawestin.

Piştî danasîna hevokên aloz em aniha dixwazin behsa biker û bikerên hevreferans jî bikin û derbasî bingeha xebatê bibin. Kesê ku kar dike yan xwedîyê rewşa di risteyê da hatîye dîyarkirin biker e (Bilbil&Baran, 2008, r. 102). Ango yê ku kar dike û yê ku xwedîyê rewşekê ye biker (subject) ye (Yıldırım, 2012, r. 302). Biker jî wekî pêveberê ji bo pêkanîna risteyê pêwîst e. Mînak; *Min nan kirî* di vê risteyê da yê ku karê kirînê dike *min* e, loma *min* bikera hevokê ye. Gava ku hevok, hevokeka aloz be herî kêm ji du lêkeran pêk dihê. Her lêkerek jî bikerekê divê. Loma di hevokeka aloz da divê herî kêm du biker hebin. Gava ku her du biker ji heman kesî pêk bihên hingê em dibêjin bikerên hevreferans. Wekî mînak em dikarin vê hevokê nîşan bidin: *Ez nikarim bi benda te kevim* (Ronî War,

Nêrîneke Windayî, CD-365)[2]. Di vê hevoka aloz da him lêkera *nikarim* him ya (bi) *kevim* ji alîyê heman bikerê ve pêk hatine û gireyên heman kesî wergirtine. Loma her du biker hevreferans in. Yek jê ketîye lê yek hêj di hevokê da cih digire. Gava ku bikera hevoka duyem bi ya yekem ra hevreferans be bi gelemperî cihnav dihê jêbirin (Haig, 2004, r. 84). Ango jêbirina cihnavan wekî stratejîyeka herî xurt dixuye di bikaranîna bikerên hevreferans da (Givon, 1983, r. 17-20). Lê hin hevok hene tevî ku xwedî bikerên hevreferans in jî her du biker jî di hevokê da cih digirin. Wekî mînak; *Te xwestibû tu xwe ji ber lêdanên wan biparêzî* (Firat Cewerî, Girtiyê Şeva Reş, CY-369). Di vê mînakê da bikera hevoka bingehîn *te* ye, bikera hevoka temamker jî *tu* ye. Her du biker jî heman kes in. Ango her du biker jî kesê duyem yê yekhejmar in û hevreferans in. Lê beravajîyê mînaka pêşî, bikera hevoka temamker neketîye. Di dewama vir da em dê pirtir bala xwe bidine sedemên vê cudahîyê. Gelo bikerên hevreferans çima carinan ji hevokê dikevin lê çima carinan ji hevokê nakevin? Pêkerên ku bandorê li ser vê ketin/neketinê dikin çi ne? Em dê van pirsan bibersivînin. Lê berîya ku em behsa pêkeran bikin em dixwazin bibêjin ku bikaranîn yan jêçûna bikerên hevreferans sedî sed ne dîyar kirîye. Hin sedem bikaranîna bikerên hevreferans xurt û bihêz dikin, beravajîyê vê hin hene ku bikerên hevreferans ji hevokê diavêjin. Çi ne ev pêker? Em dê li ser çar pêkerên giring bisekinin: Kes, dem, têperî-têneperî, cureyên hevokên aloz. Em bi ya pêşî dest pê bikin. 41

**1. Kes**

Di vê beşê da em dê behsa kesên ku rola bikerê werdigirin bikin. Me kes wekî çar beşan dabeş kirîye: Kesê yekem yê yekhejmar (ez, min), kesê duyem yê yekhejmar (tu, te), kesê sêyem yê yekhejmar (ew, wî, wê) û kesên pirhejmar (em, me, hûn, we, ew, wan). Li gorî Teorîya Girêdanê *(Binding Theory)* her cihnava ku ji bo kesan dihên bikaranîn divê serbest (free) bin. Ango her cihnaveka di hevokeka da dihê bikaranîn divê kesên cihê nîşan bide (Goldwater&Rumer, 2004, r. 28). Ango ev teorî bikaranîna cihnavên cihê û ciyê wan tayîn dike (Cornie, 2006, r. 135). Di hin hevokên aloz da carinan cihnavek carinan du cihnav dihên bikaranîn. Ango hin bikaranîn hene ku zagonên Teorîya Girêdanê bin pê dikin. Di vir da em dê bala xwe bidinê bê ka gelo gava ku bikerên hevreferans ji kesên cihê pêk bihên ketina bikerên hevreferans pêk dihê yan nayê.

2 Ji bo hejmara cildên Antolojiyê em dê van bi kar bînin: CY bo cilda yekem; CD bo cilda duyem û CS bo cilda sêyem.

**1. 1. Kesê Yekem yê Yekhejmar**

Di vê beşê da em dê behsa kesê yekem yê yekhejmar bikin ku rola bikerê hildigire. Me hezar (1000) hevokên aloz yên ku bikerên wan hevreferans in ji *Antolojiya Çîrokên Kurdî* wergirtine û ravekirin û analîzên me li ser van hevokan in. Ji bo vê beşê me ji bo her kesekî sed (100) hevok berhev kir. Em bi kesê yekem yê yekhejmar (ez, min) dest pê bikin. Ji sed hevokên berhevkirî, bikerên hevreferans di 72 hevokan da ketine lê di 28 hevokan da neketine. Bikerên hevreferans di hevokên aloz yên jêrîn da ketine.

**(1) a.** *Lê ez Biroyê Şemo me, sax im, ne mirî me* (Sîma Semden, Xezal, CY- 133).
**b.** *Min serê xwe kire ber xwe, di pişika xwe da hevekî werimîm* (Emerîkê Serdar, Hetanî Kengî? CY-216).
**c.** *Ez ê binivîsim û wan bo Şexî diyarî bikim* (Mehemed Ferîq Hesen, Rojderketin, CY-256)
**d.** *Çawan ez dikarim jînê de bimînim* (Kamuran Bedirxan, Eyloyê Pîr, CY-47).
**e.** *Min nedizanî li liv û tevgerên kê ji wan binêrim* (Elaeddîn Secadî, Bo Xatirê Jinê, CY-81)[3]



Bi giştî gava em li mînakên jorîn binêrin em dibînin ku heger lêker ji alîyê dem, têperî-têneperî û kesandinê ve li hev bikin hingî ketina bikerên hevreferans bêhtir e. Lê di mînakên jêrîn da bikerên hevreferans neketine. Gava ku em bala xwe bidine her du bikerên hevokên jêrîn em dê bibînin ku bi gelemperî bikerek ji cihnava xwerû *(ez)*, bikerek ji cihnava tewandî *(min)* pêk dihê. Li gorî ku her du cure cihnav di hevokekê da hatibin bikaranîn hingî taybetmendî û binyada hevoka bingehîn û ya temamker ne heman in. Ango her du lêker li hev nakin û bikerên cihê divên.

**2)** **a.** *Her car ez li ber we sekinîm û min zimanê te parast* (Celadet Bedrixan, Gazinda Xencera Min, CY-46)
**b.** *Min bawer nedikir ez ê bikaribim zû bi zû bi ser xwe ve werim* (Fuat Temo, Çîrok, Cilda Yekem-9)
**c.** *Min nizanîbû ez ê bi van zara va kuda herim* (Erebê Şemo, Zaritoya Min, CY-67)
**d.** *Ez li ser milê xwe zîvirîm û min dit ku heşt siwar tên* (Elaeddîn Secadî, Bo Xatirê Jinê, CY-80)
**e.** *Min got ez serîkî bidim wan* (Wezîrê Êşo, Ew Çûyîn Bû-Çû,CY-202)

3 Hin çîrokên soranî di Antolojiyê da hatine wergerandin bo kurmancî. Daneyên me dê ji van wergeran bin.

### 1. 2. Kesê Duyem yê Yekhejmar

Dema ku em li kesê duyem yê yekhejmar binêrin em dibînin ku ji sed hevokî bikerên hevreferans di 41 hevokan da neketine, di 59an da ketine. Li gorî daneyên me ketina kesê yekem yê yekhejmar ji yê duyem pirtir pêk hatîye. Em dê 5 mînakan bo yên ketî û 5 mînakan bo yên neketî bidin.

**(3) a.** *Tu dixwazî min bêxî şûna hesinê solingan* (Fuat Temo, Çîrok, CY-44)
**b.** *Te destê xwe dixist bin erzînka xwe û cigareyek vêdixist* (Rauf Bêgerd, Teqîn, CY-113)
**c.** *Tu ê vexwî û sax bibî* (Sîma Semend, Xezal, CY-129)
**d.** *Tu kî yî û kûda diçî* (Tosinê Reşîd, Êtap, CY-221)
**e.** *Tu ê meraq bikî û bibêjî* (Hesenê Metê, Epîlog, CY-432)

Bikerên mînakên jorin giş kesê duyem yê yekhejmar in. Hemû biker di hemû hevokan da hevreferans in û di hemuyan da ketine. Ji ber ku lihevkirina bikeran, hevgirtina hevokan zêde ye, pêwîstî bi du bikerên heman tune ye. Loma bikerên hevreferans di van mînakan daketine. Lê beravajîyê vê, di mînakên jêrîn da tevî ku kirde dîsa kesê duyem yê yekhejmar in û hevreferans in jî, ji hevokan neketine. Lihevkirina hevok û cihnavan kêmtir e û herweha hevgirtina hevokan kêmtir e loma bikerên hevreferans neketine.



**(4) a.** *Tu dibêjîbelkî tu nû hatiyî bazarê* (Hesen Qizilcî, Serfitre, CY-91)
**b.** *Tu carekê bûyî mêvan û te odeka min tijî heyv û stêr kir* (Rauf Bêgerd, Teqîn, CY-120)
**c.** *Te çi biaqilî kir ku tu hatî* (Sîma Semend, Xezal, CY-133)
**d.** *Tu derewan dikî, te li devereke din winda kiriye* (Ferhad Pîrbal, Bazdayî, CY-363)
**e.** *Te gotibû û te texmîn kiribû* (Firat Cewerî, Girtiyê Şeva Reş, CY-369)

### 1. 3. Kesê Sêyem yê Yekhejmar

Gava ku bikerên hevreferans kesê sêyem yê yekhejmar be hingî jêçûn xurttir û pirtir e. Ji sed hevokî, bikerên hevreferans yên kesê sêyem yê yekhejmar di 96 hevokan da ketine. Tenê di 4 hevokan da neketine. Ketina bikerên hevreferans yên kesê sêyem ji kesê yekem û duyem gelekî zêdetir e û di hemû deman da xuya ye (Haig, 2004, r. 85). Dîsa em dê mînakan him ji bo ketinê him ji bo neketinê bidin.

**(5) a.** *Ew vegeriya, çû* (Erebê Şemo, Zarotiya Min, CY-67)
**b.** *Ew teyşî xewê bû û bersiv da* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-94)
**c.** *Wî nizanîbû çi bike û çi bêje* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-109)
**d.** *Wê dixwest jê re tiştekî bêje* (Sîma Semend, Xezal, CY-128)
**e.** *Ewê dem û xatirê xwe ji min xwest û ber bi senatoriya xwe çû* (Xelîlê Çaçan, Qîza General, CY-158)

Wekî ku ji heljimaran (statistic) dixuye ketinabikerên hevreferans yên kesê sêyem yê yekhejmar zêdetir e. Du sedemên sereke hene bo vê zêdebûnê: Yek jê ew e ku cihnava kesê sêyem ya yekhejmar ya xwerû (ew) û ya tewandî (wî, wê) carinan ji dêvla hev ve yan bi hev ve (ewî, ewê) dihên bikaranîn (Matras, 1997, r. 620). Bi taybetî jî nivîskarên Serhedê bikaranîna bi vî awayî zêdetir tercîh kirine. Sedema din jî bandora lihevkirina lêkerên têper û têneper yên kesê sêyem yê yekhejmar e. Ango lêker têper jî be têneper jî be bi heman gireyên kesî dihê kesandin. Loma lihevkirin xurt e û ketin zêdetir e. Tevî van sedeman dîsa jî hin bikaranîn hene ku bikerên hevreferans yên kesê sêyem yê yekhejmar di hevokê da cih girtine, neketine.

**(6) a.** *Ew jî hat meydanê û ew jî hat kuştin* (Elaeddîn Secadî, Bo Xatirê Jinê, CY-82)
**b.** *Ew dixwaze ew çi bibêje tu jî bi ya wî bikî* (Sîma Semend, Xezal, CY-134)
**c.** *Ew mirovekî sert û hişk bû, gava ku bi a wî nebûya ew pirr hêrs dibû* (Mehmûd Baksî, Xemgîniya Xerzan, CY-352)
**d.** *Wî digot ew hew dikare bêyî birayê xwe bijî* (Mehmûd Baksî, Xemgîniya Xerzan, CY-361)



**1. 4. Kesên Pirhejmar**

Dema ku bikerên hevreferans ji kesên pirhejmar (ew-wan, em-me, hûn-we) pêk dihên ketina bikerên hevreferans ne wekîkesê sêyem yê yekhejmar e. Ji 100 hevokî, di 68an da ketîye lê di 32an da neketîye. Ango ketina bikerên hevreferans yên pirhejmar ji kesê sêyem û yekem kêmtir lê ji kesê duyem pirtir e. Em dê çend mînakan bidin û derbasî beşa din bibin.

**(7) a.** *Em rabûn û rûniştin* (Mihemed Şarman, Miriyên Roja Yekşemê, CS-324)
**b.** *Hûn dikarin vê jî îmze bikin* (Qahir Bateyî, Evîna di Qutiya Sergirtî de, CS-163)
**c.** *Hûn kî ne û çi dixwazin?* (Adîl Başaran, Çîroka Sultan û Wezîr, CS-66)
**d.** *Wan jî karên xwe kirin û werîs êxistine sitûyê te* (Xelîl Duhokî, Dê Roj Helêt, CD-84)
**e.** *Ew keniyabûn û bi hev re bang kiribûn* (Şahînê Bekirê Soreklî, Azadbûna Mehmet Karataş, CY-386)

**(8) a.** *Me dev ji malê berda, em paşê kal bûn* (Yaşar Aksu, Xelweta Kalbûnê, CS-472)
**b.** *Me digot gelo em herin li ber bisekinin* (Mihemed Şarman, Miriyên Roja Yekşemê, CS-324)
**c.** *Me tûrên ceh ji serê hespên xwe derxistin û em bi rê ketin* (Mehmet Dicle, Ta, CS-238)
**d.** *Em te baş diniyasin û em pirsê hemiyê dizanin* (Sidqiyê Hirorî, Xewn jî Qedexe ne, CY-324)
**e.** *Hûn bextewar in, hûn di vî welatê azad da dijîn* (Sîma Semend, Xezal, CY-130)

Di vê beşê da em li ser kesên ku dibin bikerên hevreferans sekinîn. Me dît ku kes pêkereka giring e di ketina bikerên hevreferans da. Ketina herî zêde di kesê sêyem yê yekhejmar da pêk dihê. Bi dû ra kesê yekem yê yekhejmar e, pey ra kesên pirhejmar herî dawî kesê duyem yê yekhejmar e. Ango şert û mercên hevokên aloz bi heman rengî jî bin, gava ku kesê ku rola bikerê werdigire cuda be hingî ketin yan neketin bi rengên cihê rû didin. Nexwe kesê ku peywira bikera hevreferans digire pêkereka giring e bo ketinabikerên hevreferans. Lê ne pêkereka tenha ye, ango pêkerinên din hene ku bandorê li ketina bikerên hevreferans dikin. Em dê aniha li ser dema hevokan rawestin.



## 2. Dem

Hevokên aloz ji ber ku bûyer û lêkerên cuda dihewînin, bi hin demên jihev cihê dihên bikaranîn. Bikaranîna deman û rêzkirina lêkerên bi demên cihê kêşayî bandorê li ketin/bikaranîna bikerên hevreferans dikin. Loma em dê di vê beşê da behsa deman û rêzkirina wan bikin. Em dikarin bi giştî demên kurmancî bikin du beş: Demên daxwazî (subjunctive) (Tan, 2005, r. 292) û demên pêşker (indicative) (Tan, hb, r. 268). Em dê hevokên aloz û hêmanên wê li gorî van her du deman rave bikin.

### 2. 1. Demên Daxwazî (Subjunctive) bi Demên Daxwazî ra

Di nav hevokên aloz da hevokên bi lêkerên modal raweya daxwazî distînin. Hevokên temamker yên ku bi raweya daxwazî ne bi piranî bi koka dema niha (Haig&Opengin, 2015, r. 27) ra dihên bikaranîn. Berî koka lêkerê, gireya bi-yê dihê bikaranîn (Noorlander, 2014, r. 209). Bikera hevokên temamker yên raweya daxwazî xwerû ne, ango ne tewandî ne (Matras, hb, r. 628). Wekî me li jorê jî got hevokên aloz herî kêm ji du beşan pêk dihên: Hevoka bingehîn û hevoka temamker. Ango di hevokeka aloz da herî kêm du dem hene. Yan du dem ji heman demî pêk dihên yan jî ji demên cihê pêk dihên. Li gorî vê rêzkirinê ketina bikerên

hevreferans diguhere. Gava ku her du lêkerên hevokên aloz bi demên daxwazî bin hingî biker ji cihnavên xwerû pêk dihên û ketina bikerên hevreferans kêmtir rû dide. Ji daneyên berhevkirî, demên daxwazî di 33 hevokan da bi hev ra hatine bikaranîn. Ji van hevokan, bikerên hevreferans ji 23 hevokan ketine lê di 10an da neketine. Em hin mînakan bidin:

**(9) a.** *Ez ê çim bebika keça xwe jê re înim* (Murat Bayram, Belkî, CS-488)
**b.** *Ez ê sê roj paşê bêm, agir bera xaniyan bidim* (Receb Dildar, Kitana Spî, CS-444)
**c.** *Ez ê zanibim ku wê xemê bikişînim îşeve* (Yaşar Aksu, Xelweta Kalbûnê, CS-471)
**d.** *Em ê mîza xwe bikin û bên* (Mîran Janbar, Stêrk, CS-156)
**e.** *Tu yê wê nebînî û pê re neaxivî* (Qahir Bateyî, Evîna di Qutiya Sergirtî de, CS-185)

Ketina bikerên hevreferans yên demên daxwazî tenê di hevokên aloz yên rewşî da kêm e. Ango gava hevoka aloz hevoka rewşî be behsa du bûyerên cihê dike ku bandorê (dê) li ser hev (bi)dikin. Loma ketina bikerên hevreferans di vî cureyî da gelekî kêm e. Ne ji hevokên aloz yên rewşî be, ketina bikerên hevreferans yên hevokên bi raweya daxwazî zêde ye. Hema hema tenê di hevokên aloz yên rewşî da ev biker neketine. Lê di hevokên aloz yên temamker û hevseng da ketin gelekî zêde û xurt e.



**(10) a.** *Ger tu nimêj nekî tê di orta cehnemê de bişewite* (Hesen Ildiz, Tirspîvan, CS-482)
**b.** *Gelo ez ji wê biqetim, ez ê bikaribim yeke dinê bibînim* (Hesen Ildiz, Tirspîvan, CS-483)
**c.** *Ger tu jî zavê xwe bikujî tu ê jî poşman bibî* (Adîl Başaran, Çîroka Sultan û Wezîr, CS-68)
**d.** *Ku em bixwazin em dikanin Xwedayan jî çêbikin* (Hesenê Metê, Epîlog, CY-456)
**e.** *Ez çi bêjim ez ê barê xwe girantir bikim* (Mihemed Mukrî, Amîrdekan, CY-270)

### 2. 2. Demên Pêşker (Indicative) bi Demên Pêşker ra

Bi giştî demên ku ne bi gireya bi-yê bin em dê wekî demên pêşker bi nav bikin. Ango demên borî, dema neha û hwd demên pêşker in. Gava ku hevoka aloz û hêmanên wê ji du lêkerên bi raweya pêşker bin hingî ketina bikerên hevreferans ne zêde ye. Ji daneyên berhevkirî, ji 239 hevokên aloz yên bi raweya pêşker

bikerên hevreferans di 172 hevokan da ketine lê di 67an da neketine. Em li çend mînakan binêrin.

**(11) a.** *Ez ji mala kurê Hecî Faîq derketim û diçim* (Rehmî Kurdziman, Berçavk, CS-494)
**b.** *Min nikarîbû xwe ji tirsa mirinê xelas bikira* (Hesen Ildiz, Tirspîvan, CS-481)
**c.** *Tu xayîn î û dest bi xwîn î* (Yaşar Aksu, Xelweta Kalbûnê, CS-471)
**d.** *Em rabûn û rûniştin* (Mihemed Şarman, Miriyên Roja Yekşemê, CS-324)
**e.** *Wî navber dida çîroka xwe û hilmek li cixareya destê xwe dikişand* (Mehmet Dicle, Ta, CS-236)

Gava em bala xwe bidine mînakên ku bikerên hevreferans ketine em dibînin ku hevokên aloz giş yên hevsengin. Lêkerên bi demên pêşker bi gihanekan pev ve hatine girêdan. Lêker û cihnav pirtir li hev dikin, lewra ketina bikerên hevreferans xurttir e. Lê beravajîyê vê, mînakin hene ku bikerên hevreferans neketine. An cihnavli hev nakin an jî kirpandina cihnavan heye. Loma cihnavên hevreferans neketine, di hevokê da mane.



**(12) a.** *Ez li ser hemdê xwe bûm û min hukmê xwe li dar dixist* (Bahoz Baran, Derb, CS-312)
**b.** *Min nedît ku min çawa jê kir* (Mehmet Dicle, Ta, CS-244)
**c.** *Ez çûm malê û min bi heft avan xwe û lêvên xwe şuştin* (Lokman Ayebe, Birîn û Ramûsan, CS-291)
**d.** *Em hatin, em bi girî û bi şîneke mezin ji malê qetiyan* (Felat Dilgeş, Sêzdeh û Nîv, CD-72)
**e.** *Ma tu ker î, tu pêşiya xwe nabînî* (Pîr Rustem, Lawê Beko, CD-223)

### 2. 3. Demên Pêşker (Indicative) bi Demên Daxwazî ra

Di vê beşê da wekî ku ji sernavê jî dîyar e, du demên cihê di yek hevokê da ku hevokeka aloz e, cih digirin. Bi piranî raweya hevoka pêşî pêşker e, lê raweya hevoka alîkar daxwazî ye. Ev cure rêzkirin ketina bikerên hevreferans xurttir dike. Ji daneyên me, bi giştî 113 hevokên bi vê rêzê hene. Ji van hevokan, bikerên hevreferans di 91î da ketine, lê 22an da neketine. Ango ji daneyan aşkere ye ku ketina bikerên hevreferans hêrî zêde bi vê rêzê pêk dihê. Em li çend mînakan binêrin dê baştir be.

**(13) a.** *Ez dikarim sêniyekê bixwim* (Felat Dilgeş, Sêzdeh û Nîv, CD-73)
**b.** *Tu nizanî li çi cihî yî* (Xelîl Duhokî, Dê Roj Helêt, CD-81)
**c.** *Em dikarin te bi qinarê ve nekin* (Xelîl Duhokî, Dê Roj Hêlet, CD- 84)
**d.** *Tu nikarî gezan li wî bidî* (Cuwan Batû, Ez Rebena Te me, CD-55)
**e.** *Wî nedizanîbû bixwîne* (Şahînê Bekirê Soreklî, Azadbûna Mehmet Karataş, CY-384)

Gava ku em bala xwe bidin mînakan jorîn em dibînin ku him lêkera pêşî him ya paşî li gorî cihnavên xwerû hatine kesandin. Loma lihevkirina her du lêker û bikeran heye. Ji ber vê yekê ketina bikerên hevrefrans çêbûye. Ango gava ku lêkera pêşî bi raweya pêşker ya dema niha be û lêkera duyem bi raweya daxwazî be hingî kesandina lêkeran bi heman awayî ye. Herweha her du biker jî di forma xwerû da ne. Loma bikaranîna bikerekê maneya hevokê temam dike. Lê beravajîyê vê, gava ku lêkera pêşî bi raweya pêşker ya borî be û lêkera paşî bi raweya daxwazî be hingî kesandina lêkeran ne bi heman rengî ye. Ango lêkera pêşî ku têper be li gorî bireserê dihê kesandin û lêkera paşî li gorî bikerê. Loma lihevnekirinek peyda dibe. Du demên cihê, du bikerên cihê û du lêkerên cihê bi hev ra dihên bikaranîn. Ji ber ku lihevkirin tune ye, ketina bikerên hevreferans ne zêde û xurt e.



**(14) a.** *Min xwest ku ez hinekî tiştan li hev bînim* (Hesenê Mete, Epîlog, CY-448)
**b.** *Te xwestibû tu li hemberî yekî mîna wî qels nîşan bidî* (Firat Ceweri, Girtiyê Şeva Reş, CY-373)
**c.** *Min got: "Ez çi bikim?"* (Ferhad Pîrbal, Bazdayî, CY-363)
**d.** *Ez ne bawer im ez ê xelas bibim* (Mihemed Mukrî, Amîrdekan, CY-269)
**e.** *Min nihêrî ez ê bixeniqim* (Babayê Keleş, Dijmin jî Gotî Gayan be, CY-245)

### 3. Têperî û Têneperî

Lêkerên ku dikarin bireserê bistînin têper in (Baran, 2012, r. 186), lê yên ku nikarin bistînin têneper in (Baran, 2012, r. 187). Ev taybetîya lêkeran bandorê li ketina bikerên hevreferans dike. Di vê beşê da em dê li ser lêkerên têper/têneper û rêzkirina wan rawestin û şirove bikin. Ji alîyê têperî/têneperîyê ve, lêkerên hevokên aloz bi çar awayan dikarin bihên rêzkirin.

### 3. 1. Lêkera Têneper bi Lêkera Têper ra (Tn+T)

Du lêkerên cihê dikarin di hevokeka aloz da bi hev ra bihên bikaranîn. Di vê beşê da em dê li ser hevokên aloz yên wiha rawestin ku hevoka pêşî xwedî lêkerekatêneper e û ya paşî xwedî lêkerekatêper e. Li gorî daneyên me, ketina bikerên hevreferans herî kêm di vê rêzkirina da heye. Bi giştî, ji 71 hevokan bikerên hevreferans di 43 hevokan da ketine lê di 28an da neketine. Em çend mînakan bidin.

**(15) a.** *Ez bi xwe çîroknivîs im û ji hunera çîrokê hez dikim* (Fuat Temo, Çîrok, CY-9)
**b.** *Tu ne biyanî yî, dikarî werî* (Osman Sebrî, Li Goristanek Amedê, CY-61)
**c.** *Ew teyşî xewê bû û bersiv dida* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-94)
**d.** *Ew rawestiyabû û ji jêr ve li odeyê hildinêrî* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-97)
**e.** *Ew rûniştin û bi hev ra xeber dan* (Sîma Semend, Xezal, CY-128)

Wekî me li jorê got ketina bikerên hevreferans di vê rêzkirina da kêm e. Lê hin hevok hene ku bikerên wan yên hevreferansdikevin. Gava em li mînakên jorîn binêrîn em dibînin ku tevî ku lêkera pêşî têper e û ya paşî têneper e her du lêker ji alîyê kesandinê ve li hev dikin. Ango her du lêker li gorî heman kesî û cihnavê hatine kesandin. Sedema din jî kesê sêyem e ku jixwe me gotibû ketina bikerên hevreferans yên kesê sêyem gelekî zêde ye. Beravajîyê vê, gelek mînakên bi vê rêzkirinê hene ku bikerên wan yên hevreferans neketine. Dema ku yek baş li meyze bike, dê bibîne ku her du lêker ji alîyê binyadê, kesandin û cihnavê ve li hev nakin. Ji ber vê lihevnekirinê gava ku lêkereka têneper bi cihnaveka xwerû ra û lêkereka têper bi cihnaveka tewandî ra bihê bikaranîn hingî jêçûnabikerên hevreferans di kumancîyê da kêm e (Haig, 2004, r. 86). Wekî mînak; lêkera pêşî li gorî cihnava xwerû û kesê yekem yê yekhejmar hatîye kesandin lê ya paşî li gorî cihnava tewandî û kesê sêyem yê yekhejmar hatîye kesandin. Loma lihevkirineka bi giştî tune ye. Lewra bikerên hevreferans neketine.

**(16) a.** *Ez rabûm, min giha ji hev vejand* (Erebê Şemo, Zarotiya Min, CY-67)
**b.** *Ez hişyar bûm, min nihêrî* (Erebê Şemo, Zarotiya Min, CY-67)
**c.** *Em bi xurtî di ser wan re difiriyan û me hema xwe li malê danî* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-108)
**d.** *Em rûdiniştin û me qala zaroktiyê dikir* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-110)
**e.** *Tu heta koma dehan çûyî, te kuta kir* (Sîma Semend, Xezal, CY-132)

### 3. 2. Lêkera Têneper bi Lêkera Têneper ra (Tn+Tn)

Gava ku her du lêkerên hevokeka aloz têneper bin hingî li hev dikin. Ango lêkerên bi vî rengî tenê bi cihnavên xwerû ra dihên bikaranîn. Herweha lêker li gorî bikerê dihê kesandin. Ji ber wan taybetîyan lihevkirina lêkerên têneper xurt e. Loma ketina bikerên hevreferans jî zêde ye. Ji daneyên me bi giştî 59 hevokên bi vî rengî hene. Bikera hevreferans di 50 hevokan da ketine. Tenê di 9an da neketine. Em li çend mînakan binêrin dê baştir be.

**(17) a.** *Ez kerixî bûm, ji hal de ketibûm* (Fuat Temo, Çîrok, CY-9)
**b.** *Ez di jor da hatime xwar û ketim* (Osman Sebrî, Li Goristanek Amedê, CY-59)
**c.** *Ew vegeriya, çû* (Erebê Şemo, Zarotiya Min, CY-67)
**d.** *Ew hatin hemberî Semsam rawestîn* (Elaeddîn Secadî, Bo Xatirê Jinê, CY-81)
**e.** *Em çûn û rûniştin* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-95)

Wekî ku me li jorê jî got gava hevoka aloz ji du lêkerên têneper pêk bihê, lêker û biker pirtir li hev dikin. Dema ku yek li mînakên jorîn bînêre dê bibîne ku bi xêra vê lihevkirinê ketina bikerên hevreferans pêk hatîye. Lê hin hevokên bi vî rengî hene ku bikerên wan yên hevreferans neketine. Di mînakên jêrînda gava ku biker ji kesên pirhejmar pêk hatibe hingî bikera hevreferans neketîye. Bi heman awayî ketina bikerên hevreferans yên kesê duyem yê yekhejmar jî hindik e. Loma di mînakên jêrîn da neketîye. Mînaka duyembiker kesê yekem e. Li gorî kesan divê biker ketibûya lê neketîye. Lewra hevoka aloz hevokeka rewşî ye loma ketina bikerên hevreferans kêm e.

**(18) a.** *Em vegeriyan otelê û em razan* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-96)
**b.** *Gava ez derdikevim, ez li refek jin rast têm* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-101)
**c.** *Hûn bextewar in, hûn di vî welatê azad da dijîn* (Sîma Semend, Xezal, CY-130)
**d.** *Tu şevê dinê dereng ketî ciyê xwe, tu hinekî ji xwe ra razayî* (Sîma Semend, Xezal, CY-133)
**e.** *Lê tu jî xwe ne zar î, tu şikir xort î* (Wezîrê Eşo, Ew Çûyîn Bû-Çû, CY-191)

**3. 3. Lêkera Têper bi Lêkera Têneper ra (T+Tn)**

Du lêkerên cihê dikarin di hevokeka aloz da bi hev ra bihên bikaranîn. Di vê beşê da em dê li ser hevokên aloz yên wiha rawestin ku hevoka pêşî xwedî lêkerekatêper e û ya paşî xwedî lêkerekatêneper e. Li gorî daneyên me, piştî rêzkirina têneper+têper ketina bikerên hevreferans herî kêm di vê rêzkirina da heye. Bi giştî, ji 80 hevokî bikera hevreferans di 58 hevokan da ketîye lê di 22an da neketîye. Em çend mînakan bidin.

**(19) a.** *Tu dikarî bêminet li vira bimînî* (Wezîrê Eşo, Ew Çûyîn Bû-Çû, CY-204)
**b.** *Tu dixwazî eseyî îro vegerî* (Wezîrê Eşo, Ew Çûyîn Bû-Çû, CY-205)
**c.** *Min jî karibû bin wan name da çend xebera binvîsim* (Emerîkê Serdar, Hetanî Kengê?, CY-217)
**d.** *Min xwest paş da vegerim* (Emerîkê Serdar, Hetanî Kengê?, CY-246)
**e.** *Em ê wê bihêlin û bên cem te* (Şêrzad Hesen, Min, CY-292)

Gava ku her du lêkerên hevoka aloz ne di dema borî da bin hingî li hev dikin. Ango her du lêker jî li gorî bikerê dihên kesandin. Loma li hev dikin û bikera hevreferans dikare bihê jêbirin. Herweha hevokên aloz yên modal ji alîyê maneyê ve pirtir girêdayî hev in. Ango biyekbûna wan (integration) zêdetir e. Loma her du hêmanên hevoka aloz wekî yekeyekê tev digerin. Loma bi bikerekê tenê mane temam dibe. Lê gava ku hevoka aloz ne modal be hingî biyekbûn kêm e. Loma her lêkerek bikerekê divê. Herweha gava ku lêkereka hevok aloz bi dema borî be û ya din ne bi dema borî be hingî lihevkirin zehmet dibe. Ji ber ku lêkerên têper di dema borî da li gorî bireserê, yên têneper li gorî bikerê dihên kesandin lêker li hev nakin. Loma ji alîyê kesandinê ve tevlîhevîyek çêdibe. Ji ber van sedeman ketina bikerên hevreferans kêm e.



**(20) a.** *Min zanîbû ez ê wê salê herime mektebê* (Emerîkê Serdar, Hetanî Kengê?, CY-217)
**b.** *Min nihêrî ez ê bixeniqim* (Babayê Keleş, Dijmin jî Gotî Qayan Be, CY-245)
**c.** *Tu tiştekî bêjî tu tawanbar î* (Mihemed Mukrî, Amîrdekan, CY-272)
**d.** *Min bawer nedikir ku ez ji wê bilindahiyê firîbûm* (Sidqiyê Hirorî, Xewn jî Qedexe ne, CY-323)
**e.** *Min dît ku ez li ber deriyê malê me* (Rojen Barnas, Hecî Mihemed Eliyê Qelşo, CY-345)

### 3. 4. Lêkera Têper bi Lêkera Têper ra (T+T)

Gava ku her du lêkerên hevokeka aloz têper bin hingî li hev dikin. Ango lêkerên bi vî rengî wekîbiker tenê bi cihnavên tewandî ra dihên bikaranîn. Herweha lêker li gorî bireserê dihê kesandin. Ji ber wan taybetîyan lihevkirina lêkerên têper xurt e. Loma ketina bikerên hevreferans jî zêde ye. Ji daneyên me bi giştî 188 hevokên bi vî rengî hene. Bikera hevreferans di 152 hevokan da ketîye lê di 36an da neketîye.

**(21) a.** *Wî nedixwest êdî erdê xwe jî bi deman bide gundiyan* (Mahmûd Baksî, Xemgîniya Xerzan, CY-359)
**b.** *Min temaşe kir û got* (Ferhad Pîrbal, Bazdayî, CY-364)
**c.** *Min xwest çente û barê xwe bipêçim* (Ferhad Pîrbal, Bazdayî, CY-364)
**d.** *Wî dest pê kir li doraliya xwe binêre* (Şahînê Bekirê Soreklî, Azadbûna Mehmet Karataş, CY-386)
**e.** *Tu ê meraq bikî û bibêjî* (Hesenê Metê, Epîlog, CY-433)

Dema ku her du lêkerên hevoka aloz têper bin lihevkirina hêmanên hevokê hêsantir e. Ango her du lêker jî bi heman awayî tevdigerin. Gava her du lêker di heman demê da bin hingî ketina bikera hevreferans zêdetir e. Lê gava yek di dema borî û ya din di raweya daxwazî da bin ketina bikera hevreferans ne ewqasî zêde ye. Loma di hin mînakan da bikerên hevreferans ji hevokan neketine.



**(22) a.** *Min kaxez û pênûsk xistin destê xwe û min dest bi nivîsandinê kir* (Ferhad Pîrbal, Bazdayî, CY-366)
**b.** *Te gotibû û te texmîn kiribû* (Firat Ceweri, Girtiyê Şeva Reş, CY-369)
**c.** *Te xwestibû tu xwe ji ledanên wan biparêzî* (Firat Cewerî, Girtiyê Şeva Reş, CY-369)
**d.** *Hûn ê hemû wilo derewan bikin, hûn ê me bixapînin* (Firat Cewerî, Girtiyê Şeva Reş, CY-369)
**e.** *Min xwest ez rewşa literatura zimanê malî ji nêzîktir bibînim* (Hesenê Metê, Epîlog, CY-452)

### 4. Cureyên Hevokên Aloz

Sê cureyên hevokên aloz di xebata me da cih girtine: Hevokên aloz yên temamker hevokên aloz yên rewşî û hevokên aloz yên hevseng. Cureya hevoka aloz bandorê li ketina bikerên hevreferans dike. Di vê beşa da em dê hevokên aloz bikin sê binbeş û li gorî daneyan em dê mînakan şirove bikin.

### 4. 1. Hevokên Aloz ku bi Hevokeka Sereke û yeka Nesereke Ava Dibin

Hevokên aloz ji du hevokan pêk dihên. Hevoka pêşî hevoka bingehîn û hevoka duyem hevoka temamker e. Hevoka temamker him ji alîyê maneyê ve him ji alîyê binyadê ve hevoka bingehîn temam dike. Ji wan cure hevokên aloz ra jî em dibêjin hevokên aloz. Hevoka temamker wekî biresera hevokê tev digere, ji alîyê mane û binyadê ve hevoka bingehîn temam dike (Givon, 2001a, r. 39). Hevokên temamker wekî hêmaneka pêwîst ya hevokê dihên bikaranîn. Rola wan di hevokê da bireserî ye ku hevoka bingehîn temam dikin (Noonan, 1985, r. 43). Ji hevokên aloz, em dê li ser wan hevokan rawestin ku ji lêkerên modal û PPVyê (pêhisîn, pêzanîn, vegotin) pêk dihên.

#### 4. 1. 1. Hevokên Aloz ku bi Modalan Ava Dibin

Hin lêker hene ku têper in û hevokekê wekî biresera xwe distînin. Wekî mînak gava ku em dibêjin: *Ez dikarim erebeyê biajom* hêmana pêşî *ez dikarim* e ku hevoka bingehîn e û ji lêkereka modal (karîn) pêk dihê. Hêmana duyem *erebeyê biajom*e û hevoka bingehîn temam dike. Bikerên her du lêkeran jî heman kes (ez) in (Gultekin, 2019, r. 20-21). Lêkerên ku maneyên mîna karîn, xwestin, texmîn, ihtîmal û hwd. dihewînin lêkerên modal in. Wekî mînak; *karin, xwestin, şiyan, hewldan, biryardan, hêvîkirin* wan maneyan di xwe da dihewînin û hevokeka din wekî biresera xwe divên. Loma em ji van lêkeran ra dibêjin “lêkerên modal” (Givon, 2001a, r. 149-150). Herweha gava ku lêkerên modal hevokên temamker yên bireserî distînin hevokên aloz pêk dihên. Ji danayên me bi giştî 105 hevokên aloz yên bi modalan hene. Bikerên hevreferans di 85 hevokan da ketine lê di 20an da neketine.

**(23) a.** *Ya rastî, ez naxwazim serê te biêşînim* (Hesenê Metê, Epîlog, CY-446)

**b.** *Ez bişêmtiştekî bêjim* (Ciwanmerd Kulek, Barava, CS-365)

**c.** *Tu dixwazî rengê xelîfekî edebiyatê bidî xwe* (Hesenê Metê, Epîlog, CY-455)

**d.** *Em dixwazin maneyekê bidin bêwatebûna jiyanê* (Suzan Samanci, Ji Rojenûska Keçikekê, CD-61)

**e.** *Wî xwast berê xwe bidaya dilê lêwik* (Jan Dost, Mistek Ax, CD-166)

Biyekbûna (integration) hevokên aloz yên yên bi modalan xurt e. Loma her du hêmanên hevoka aloz wekî yekeyekê tev digerin. Gava hevoka aloz wekî yekeyekê be hingî pêwîstî bi du bikeran tune ye. Loma bikerên hevreferans di he-

vokên aloz yên bi modalan da dikevin. Lê hin mînak hene, mîna yên jêrîn, ji alîyê deman ve li hev nakin. Ango dema lêkera modal dema borî be û lêkera pey ra ne borî be hingî ji alîyê kesandinê ve tevlihevîyek çêdibe. Lêkera modal ya bi raweya borî li gorî biresera hevokê be, lêkera hevoka temamker jî li gorî bikerê b hingî kesandina cihnavên cuda pêwîst e. Ji ber vê him di hevoka bingehîn ku modal e him jî di ya temamker da biker divê bihên bikaranîn. Loma di mînakên jêrîn da ketina bikerên hevreferans pêk nehatîye.

**(24) a.** *Me dixwest cara ewilî em vê mêraniyê nîşan bidin* (Qedrî Can, Guneh, CY-55)
**b.** *Min dixwest ez têbigihîjim bê ka jandar e* (Şener Özmen, Keleh, CS-79)
**c.** *Min nexwest ez zêde biaxivim* (Bahoz Baran, Derb, CS-319)
**d.** *Min hewl da ku ez herim cem wê* (Hesen Ildiz, Tirspîvan, CS-483)
**e.** *Te xwestibû tu ji ser kursiya xwe bipekî* (Firat Ceweri, Girtiyê Şeva Reş, CY-370)

**4. 1. 2. Hevokên Aloz yên bi Lêkerên PPVyê Ava Dibin**

Lêkerên ku maneyên pêhisîn, pêzanîn û veguhastinê dihewînin em bi kurtasî dibêjin lêkerên PPVyê. Lêkerên pêhisînê ew lêker in ku mirov bi xêra wan bi tiştekî dihese. Lêkerên pêhisînê ev in: *dîtin, bihistin, hiskirin, nêrîn, meyzekirin û hwd.* Lêkerên pêzanînê zanînê îfade dikin û ev in: *zanîn, fêmkirin, têgihiştin, ferqkirin, bawerkirin û hwd.* Lêkerên vegotinê veguhastina axiftinê dihewînin û pirtir ji lêkera *gotin*ê pêk dihên (Bülbül, 2017, r. 109-112). Ji danayên me bi giştî 26 hevokên aloz yên bi lêkerên PPVyê hene. Bikerên hevreferans di 9 hevokan da ketine lê di 17an da neketine. Wekî ku ji daneyan jî dîyar e ketina bikerên hevreferans di hevokên aloz yên PPVyê da gelekî kêm e. Em hin mînakan bidin.



**(25) a.** *Ez zanim vê carê çawa wî nerm bikim* (Şêxo Fîlîk, Tu Hemza yî, CS-307)
**b.** *Wî jî nedizanî ka çima lê digere* (Mîran Janbar, *Stêrk*, CS-167)
**c.** *Wî jî dizanîbû ku li herêmê bimîne* (Yakup Meşe, *Sindiyanî Talo*, CS-99)
**d.** *Ez nizanim di hemî destan de govendê bigirim* (Fatma Savci, *Dîlan û Kevî*, CS-128)
**e.** *Tu nizanî li çî cihî yî* (Xelîl Duhokî, *Dê Roj Hêlet*, CD-81)

Bikerên hevreferans yên hevokên aloz, yên PPVyê wekî ku me li jorê jî got zûbizû nakevin. Di mînakên jorîn da bikerên hevreferans ketine. Gava em bala xwe didine wan, em dibînin ku lihevkirina lêkeran, deman û cihnavan heye. Loma heta radeyekê destûra ketina bikerên hevreferans heye. Lê gava ku lêker ji alîyê

dem û cihnavan ve li hev nekin hingî pêwîst e ku biker di hevokê da be. Herweha maneya lêkerên PPVyê û hevoka wan ya temamker ne zêde pev ve girêdayî ye. Ango wekî du bûyerên cihê dixuyin. Ji ber vê, ketina bikerên hevreferans yên hevokên aloz yên PPVyê gelekî kêm e.

**(26) a.** *Min nizanîbû ez ê çi bibêjim* (Hesen Ildiz, *Tirspîvan*, CS-485)
**b.** *Min got ez avekê di firaxên şîvê wer dim* (Burhan Tek, *Şevbihêrk*, CS-407)
**c.** *Min mêze kir ku ez di nav kul û derdan de nikarim lê binêrim* (Bahoz Baran, *Derb*, CS-320)
**d.** *Tu nabînî tu ji hev ketiyî* (Bahoz Baran, *Derb*, CS-320)
**e.** *Me digot em herin li ber bisekinin* (Mihemed Şarman, *Miriyên Roja Yekşemê*, CS-324)

**4. 2. Hevokên Aloz yên Rewşî**

Hevokên aloz yên rewşî jî ji hêmanan pêk dihên: hêmana pêşî hevoka bingehîn e û hêmana dawî hevoka temamker e ku ji alîyê rewşê ve hevoka bingehîn temam dike. Hevoka temamkerya rewşî, pirtir piştî hevoka bingehîn dihê. Agahîyên zêdetir di derbareyê hevoka bingehîn da dide. Ji alîyê maneyê ve hevoka bingehîn temam dike. Sedem, armanc, dem û merca hevoka bingehîn dîyar dike (Endley, 2010, r. 919). Wekî mînak em dikarin vê hevokê bidin: *Ez hatim te bibînim. Ez hatim* hevoka bingehîn e, *te bibînim* hevoka bingehîn ji alîyê armancê ve temam dike. Loma hevoka temamker hevokeka rewşî ye (Gultekin, hb, r. 12). Ji daneyên me, bi giştî 26 hevokên aloz yên rewşî hene. Bikerên hevreferans di 13 hevokan da ketine lê di 13an da neketine. Hevokên aloz yên rewşî ji ber ku têkîlîya du bûyerên cihê vedibêjin biyekbûna wan kêm e. Loma wekî du hevokên serbixwe xuya dikin. Ji ber vê yekê, ketina bikerên hevreferans ya hevokên aloz yên rewşî ne zêde ye. Em li mînakan binêrin dê baştir be.

**(27) a.** *Ez ê biçim wê birevînim* (Elaeddîn Secadî, *Bo Xatirê Jinê*, CY-79)
**b.** *Ku min ev gotinên wî bihîstin, ji hêz û taqet ketim* (Elaeddîn Secadî, *Bo Xatirê Jinê*, CY-79)
**c.** *Ez ê herim xwarinê bixwim* (Husên Arif, *Rêwîtiyeke Efsûnî*, CY-99)
**d.** *Gava ew hat ser hişê xwe ber bi jor ve nerî* (Husên Arif, *Rêwîtiyeke Efsûnî*, CY-109)
**e.** *Ez amade me ku alikariya te bikim* (Husên Arif, *Rêwîtiyeke Efsûnî*, CY-109)

Me li jorê got ku bikerên hevreferans yên hevokên aloz yên rewşî zêde nakevin. Lê dîsa jî di hin hevokan da bikerên hevreferans ketine. Gava em bi baldarî li mînakên jorîn binêrin em dibînin ku bikerên hevreferans ji hin hevokan ketine ku ev hevok têkîlîya armanc û encamê dihewînin. Herweha di mînaka çarem da biker kesê sêyem yê yekhejmar e, loma ketina bikera hevreferans muhtemel e. Di mînaka duyem da jî têkîlîya mercî û encamê heye û bikerek ketîye. Lê gava em li mînakên jêrîn binêrin em dibînin ku hin bikaranînên beravajîyê mînakên jorîn hene. Pirtir bikerên hevreferans neketine di hevokên rewşî da ku ji alîyê demê ve hevoka bingehîn temam dikin. Ango ji alîyê demê ve bûyerek berî yan piştî buyereka din qewimîye. Ango du bûyerên ne hemdemî di vir da hene. Loma wekî du hevokên serbixwe tevdigerin. Ji ber wê bikerên hevreferans ji hevokan neketine.

**(28) a.** *Ku min ev yek dît ez qehirîm* (Elaeddîn Secadî, Bo Xatirê Jinê, CY-78)
**b.** *Berê her cara ku ez diçûm min li derî dixist* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-94)
**c.** *Piştî ku ez diçûm min nema li derî dida* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-94)
**d.** *Heta ku me ji wê taxê bar kir jî em bi hev re nepeyivîn* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-94)



**e.** *Heta ku ez kurê diya xwe bûm ez di wê kolanê re nediçûm* (Husên Arif, Rêwîtiyeke Efsûnî, CY-98)

### 4. 3. Hevokên Aloz yên Hevseng (Coordination)

Hevokên aloz yên hevseng jî wekî hevokên aloz yên din ji du hevokan pêk dihên. Her du hevok jî bingehîn in û giring in. Her du hevok bi xêra gihanek yan xalbendan bi hev ve dihên girêdan. Her du hevok bûyerên ku bi hev rayan dû hev ra pêk hatine dihewînin û di navbera her du hevokan da an xalbendek an gihanekek heye (Nordquist,2019). Ji daneyên me bi giştî 247 hevokên aloz yên hevseng hene. Bikerên hevreferans di 197 hevokan da ketine lê di 50î da neketine. Ango li gorî daneyan piştî hevokên aloz yên modal, ketina bikerên hevreferans herî zêde di hevokên aloz yên hevseng da pêk dihê. Em çend mînakan bidin.

**(29) a.** *Ez ê sê roj paşê bêm, agir bera xaniyan bidim* (Receb Dildar, Kitana Spî, CS-444)
**b.** *Tu xayîn î û dest bi xwîn î* (Yaşar Aksu, Xelweta Kalbûnê, CS-471)
**c.** *Em rabûn û rûniştin* (Mihemed Şarman, Miriyên Roja Yekşemê, CS-324)
**d.** *Em jê derbas bûbûn û çûbûn* (Îlhamî Sîdar, Guneh, CS-26)
**e.** *Wê her dikir û bang dikir* (Rêzan Nas, Gelo Çima, CS-35)

Ji ber ku hevokên aloz yên hevseng du hevokên ku dişîbin hev pev girê didin, li hev dikin. Loma bikerên hevreferans di piranîya van hevokan da dikevin. Lê hin hevokên aloz yên hevseng hene ku bikerên hevreferans ji wan nakevin. Mînakên jêrînbikerên hevreferans nexistine. Ji alîyê lihevkirinê ve pirsgirêk heye, hevokên jêrînyan ji alîyê deman ve yan jî ji alîyê têperî/têneperîyê ve ne wekî hev in. Loma her hevokek (bûyerek, lêkerek) bikereka cihê divê. Ji ber vê bikerên hevreferans ji van hevokan neketine.

**(30) a.** *Min xwe negirt û ez ketim ser wê xezalê* (Bahoz Baran, Derb, CS-318)
**b.** *Me ji kirinê zêdetir xwend û em bi şevan li hev siwar bûn* (Kawa Nemir, Qehweyek Li Gel Hev, CS-122)
**c.** *Min nema xwe girt û dengekî hêrsbûyî ez bi ser da peyivîm* (Yaqob Tilermenî, Bermeqlûb, CD- 232)
**d.** *Tu kî yî, tu ji kû hatiyî* (Çiya Mazî, Wey Gewre Wey, CD-240)
**e.** *Em jî hilkişiyan ser xênî û me meraq kir* (Mahmûd Baksî, Xemgîniya Xerzan, CY- 350)

Li gorî daneyên me cureya hevoka aloz bandorê li ketina bikerên hevreferans dike. Herî zêde hevokên aloz yên modal bikerên hevreferans ji hevokê diavêjin. Tevî ku hevokên aloz yên PPVyê jî hevokên aloz yên temamker in li gorî yên modal ketina bikerên hevreferans gelekî kêm e (Givon, 2001b, r. 50). Herweha hevokên aloz yên hevseng pirtir destûra ketina bikerên hevreferans didin. Lê hevokên aloz yên rewşî zêde destûrê nadin bikerên hevreferans ku ji hevokê bikevin. Ji lewra hevokên aloz yên rewşî bahsa du bûyerên cihê dikin ku bandorê li hev dikin. Loma bûyerên cihê bikerên cihê divên.



## Encam

Gotara me li ser çar pêkeran disekine ku bandorê li ketin/bikaranîna bikerên hevreferans dikin. Ev pêker ev in: Kes, dem, têperî/têneperî, cureya hevoka aloz. Ji daneyan û analîzan ev encamên jêrîn hatin bidestxistin.

Kesên ku rola bikeran werdigirin bandorê li ketina bikerên hevreferans dikin. Ji ber ku cihnava kesê sêyem ya xwerû (ew) û tewandî (wî, wê) têkilhev (ewî, ewê) bûye û lêkerên têper yên dema borî li gorî kesê sêyem dihên kesandin, ketina bikerên hevreferans herî zêde ji bo kesê sêyem yê yekhejmar pêk dihê. Piştî kesê sêyem, kesê yekem, kesên pirhejmar û kesê duyem yê yekhejmar dihê.

Gava ku lêkerên hevokên aloz bi raweya daxwazî bin hingî ketin pirtir rû dide. Ango her du lêker hingî ji alîyê kesandinê ve li hev dikin û hewceyî bi du bikerên hevreferans tune ye. Herweha lihevkirina lêkerên bi raweya daxwazî û dema pêşker ya niha heye. Loma di van cure hevokan da ketina bikerên hevreferans pêk dihê. Lê gava ku her du lêkerên hevoka aloz yek bi dema borî be û ya din ne bi dema borî be hingî tevlihevîyek çêdibe. Lêkerek li gorî bikerê yek li gorî bireserê dihê kesandin loma nakokî peyda dibe. Ji ber vê her du lêkerên bi demên cihê bikera xwe divên. Loma ketina bikerên hevreferans kêmtir e.

Pêkera din ya ku bandorê li ketina bikerên hevreferans dike têperî/têneperî ye. Dema ku her du lêkerên hevoka aloz têneper bin hingî ketina bikerên hevreferans herî zêde ye. Ji lewra lêkerên têneper cihnavên xwerû divên û kesandin li gorî bikerê ye her dem. Ku her du lêker têper bin dîsa li hev dikin û ketin pêk dihê. Lê gava yek têper û yek têneper be hingî her du lêker ji alîyê dem, cihnav û kesandinê ve dibe ku li hev nekin. Ji ber vê ketina bikerên hevreferans hindik pêk dihê.

Pêkera dawî cureya hevoka aloz e. Ketina bikerên hevreferans herî zêde di hevokên aloz yên modal da pêk dihê. Lêkera modal û temamkera wê wekî yekeyekê ne loma pêwîstî bi du bikeran tune ye. Hevokên aloz yên hevseng jî destûrê didin ku bikerên hevreferans bikevin. Lê hevokên aloz yên PPVyê û rewşî zêde destûrê nadin. Ev hevok, du bûyerên cihê dihewînin ku biyekbûna wan kêm e. Loma girêdana wan ne xurt e. Ji ber vê bikerên hevreferans ji hevokan pir nakevin.

**Çavkanî**

Aydogan, Î. S. (2013). *Guman-1, demnasî, hevoksazî, manesazî û gotar*. Ankara: Lîs.

Baran, B. (2012). *Rêzimana kurmancî*. Stenbol: Belkî.

Bilbil, M. & Baran, B. (2008). *Rêzimana kurmancî*. Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Amedê.

Bülbül, M. (2019). Risteyên aloz di kurmancî da. *Humanities Journal.* 7(2), 263-273.

Bülbül, M. (2017). *Sazkirina riste û frêzan û peyvrêziya wan di devoka jorîn de*. (Teza Doktorayê), Zankoya Zaxoyê, Fakulteya Zanistên Mirovayetî, Pişka Zimanê Kurdî, Zaxo.

Cewerî, F. (2018). *Antolojiya çîrokên kurdî*. Stenbol: Avesta.

Cornie, A. (2006). *Syntax: A generative indtroduction*. Oxford: Blackwell Publishing.

Endley, M. J. (2010). *Linguistics perspective on English grammar*, IAP.

Givon**,** T. (2001). *Syntax***,** *an introduction*, (Volume I. ). Amsterdam/Philadelphia:John Benjamins Publishing Company.

Givon**,** T. (2001). *Syntax***,** *an introduction*, (Volume II. ). Amsterdam/Philadelphia:John Benjamins Publishing Company.

Givon, T. (1983). *Topic continuity in discourse: A quantitive cross-language study*. Amsterdam/Philadelphia:John Benjamins Publishing Company.

Goldwater, M. & Rumer, J. (2004). Coreferential interpretation of reflexives in picture. in *Linguistic Society Conference*. Texas.

Gültekin, S. (2019). *Hevokên temamker ên berkarî yên kurmancî yên devoka torê.* (Teza Lîsansa Bilind a Bitez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Haig, G. (2004). *Alignment in Kurdish: a diachronic perspective (Empirical approaches to language typology*. Berlin: Mouton de Gruyter.

Haig, G. and Öpengin, E. (2015). *Kurmanjî Kurdish in Turkey* in Bulut, Chrisriane (ed.) Linguistic Minorities in Turkey and Turkic speakingminorities of the

perigheries, Wiesbaden: Harrassowitz.

Matras, Y. (2002). Kurmanji complementation: Semantic-typological aspects in an areal Perspektive. *in Sprachtypol Univ. Forsch.* (STUF)

Matras, Y. (1997). Clause combining, ergativity, and coreferent deletion in Kurmanji. *Studies in Language* 21, rr. 613–653.

Noonan, M. (1985). Complementation, in Shopen, Timothy (Ed. ), *Language Typology and Syntactic Description*, c. 2. , Complex Constructions. Cambridge: Cambridge University Press, rr. 52-150.

Nordquist, R. (2019). *Coordinate Clause in Grammer*, Thoughtco.

Noorlander, P. (2014). Diversity in convergence: Kurdish and Aramaic Variation Entagled. *Kurdish Studies*, 2(2), 201-224.

Öpengin, E. (2014). Repertuara zimanî û afirandina edebî: Nirxandineke zimannasî li ser edebiyata kurmancî ya hevçerx, di *Tîr û Armanc* da (Öpengin, Ergin û Alan, Remezan ed.), Stennbol: Peywend.

Yıldırım, K. (2012). *Kürtçe dil bilgisi*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi.

Tan, S. (2005). *Rêziman û rastnivîsa zaravayê kurmancî*, Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê